

Diyarbekrê Jinên Her Çar Perçên Kurdistanê Li Hev Civandin

Roja 25'ê Nîsana 2010'an, Konferansa Jinên Kurd, ya ku ji aliyê Tevgera Jinên Azad ên Kurd ve li Amedê hatî organîzkirin, bi beşdarbûna gelek parlementer, Serokşaredar, Siyasetvan û jinên rewşenbîr ji parçeyên din yên Kurdistanê beşdar bûne, li Salona resepsiyona Sumerparkê destpêkir. Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, Parlamenterên BDP'ê yên jin, Siyasetvana Kurd Leyla Zana, Ji Kurdistana Îranê Nahîd Husênî (helbestvan û endama Komîteya Navendî a PDK Îranê), ji PDK'ê Şîrîn Amêdî û Emîne Zikrî, ji Goranê Kwêstan Muhemed Abdulla, ji YNK'ê Emel Cemal, ji Parlamentoya Îraqê Ala Talebanî û Parlamentera Ewropa ya berê Feleknaz Uca û ... amade bûn.

Konferansê ji aliyê Siyasetmedara Kurd, Leyla Zana ve hat vekirin û li ser girîngiya vê konferansê axivî û got: Girîngiya vê konferansê ew e ku jinên dîasporayê û yên li Kurdistanê cara ewil e tîm cem hev. Lewma ev konferans hem ji bo jinan teybet e û hem jî wek rojêke dîrokî ye, ev cejna ronîşana jinên Kurd e. Herweha got: Pirsgirêka herî mezin ya jinan, azadî ye. Û banga yekitiyê li Kurdan kir û got, "Jinên Kurd, li aliyek bo nasnameya xwe ya jinî, li aliyê dîtir jî bo nasnameya xwe ya neteweyî têkoşiyar." Bi fikrên xwe, çalakî û meşên xwe her tim bo bidestxistina herdu nasnameyan hewl dan. Bi vê awayê jina Kurd bû deng û rengê bindest û bêdeng.

Zana li ser pirsgirêkên jinên Kurd jî rawestiyê û got: " Sedema vê konferansê ne tenê neheqiyên ku li jina dibin e. Herwisa ricim, suneta jinan, kuştinên ji bo namûsê,

şideta di nava malbatê de, berdêl, zewaca bi zorê, tundiya cinsî, tacîz, destdirêjî û qedexeya zimanê zikmakî jî hîn wek pirsgirên jinan dom dikin. Zana got em dizanin ku ev pirsgirêk îro zû bi zû çareser nabe, lê bi karekî hevbeş û hevkarîyan dikare tesîra kêmkirinê çêbike. Zana herweha bal kişande ser Peymana Qesrî Şîrîn ku Kurdistan parçekiriyê û Peymana Lozanê ku Kurd tune hesabandiyê. Zana got, tiştên ku Kurd dijîn barê van herdu peymanan e û domand, "Ev bar siyasî, civakî, kulturî, olî û aborî ye. Konferansê bi du roj karên berdewam û bi nîqaşên li ser mijara `pirsgirêkên civakî û siyasî yên Kurd, redkirin û înkarkirina nasnameya netewî û politîkayên dewletê` berdewam serkeftiyane dawî bi karê xwe anî. **Ji Kovara Agirî . H 134**

Dumahîk : Dawiya zorê....

çima vê kiryarên nemirovane nabîne, ta kengê ewê çavên xwe damirînin û guhên xwe bigirin û li pey berjewendiyên xwe bibezin ,û mafên mirovan binpê bikin !.

Bêgûman, tu dar serên xwe gihane esmanan nîne, dawiya zorê rûreşî ye û ew roj jî nîzîk e. Ehmedî Necad û dûfçilkên xwe wê şermezar, riswa, û rûreş bibin. Em di wa baweriyê de ne, ku ew jî mîna cîranê xwe Sedam û hevriyên wî wê werine darvekirin. Eger- bi rastî -baweriyaya wan diktetoran, bi ola îslamî hebe, di Qurana pîroz de jî hatiye gotin: Kesê kuştinê bi kar bîne -ger piştî demekê be-tê ye kuştin? Ev yeka jî, di dîroka mirovan de pir cî girtiye?. Weke mînak em dîr neçin, hema li dawiya rewşa Sedamê xwînaxwar bimeyzînin, çawa û bi çi rengî herdu kurên wî hatine kuştin û malbata wî tarûmar bûye, pişt re ew jî hate darvekirin !. Ma gelo! Ehmedî Necad ji vê bûyera nêzîk, sûdan wernagire, li xwe venagere û lêborînê, tika û lava ji gelê Kurd nake, ji berî ew jî tîk ye dere.... !!
